OL Û NETEWEYA KURD DI ŞÛNA ÎSLAMÊ DE

Nivîsîna: Mihemed Sadiq
Wergêrandin ji erebî: Îsmet KILIÇARSLAN

PIŞKA DUYÊ

YEKÎTIYA OL

Bandora vê mercê ji bo avakirina gel û neteweyê gelek giran e. Çawan ku dîrok ji vê yekê re guwahî dide. Lê divê ku ol çawan me gotî, ji xerez, lêp û xurafeyan paqij be, li ser bingeh û resana xwe ya pêşîn ma be, hemû deshilatên wê li ser hemû takekesan bê awarte, bi parêzkarî û dadperwerî wek hev bête bi karanîn.

Ola rast û durist ew e ku ji hemû xerezên siyasî, ji berjewendiyên heyberî û ji xurafeyan paqij be. Mirovên oldar eger çi li ser nêziktirînê xwe jî be rastiyê dibêje û deshilata xwe li ser dijminê xwe yê herî dijwar jî bi dadî bi kar diîne.

Çawan ku kurê xelîfeyê duwem Omer (x.r.) hat qesaskirin û xelîfeyê çarem Elî (x.r.) bi yekî cihû re hat darizandin.

Ango ola ku hemû mirovan di hemû maf û pêwistiyan de mîna didanê şehê, di çexêza mirovahiyê de wek hev digire. Ne ola ku bûye amûr û navgîn ji bo mebest û berjewendiyên nijadperestan. Ne ola ku nezan, serkêş, Fir'ewn û simsarên wan ên îroyîn bi kar diînin. Her wesan, hin gelên hov hatin nav cihaniyên musulman de, dîtin ku bi navgîniya ola islamê, bi riya kurt û bi hesayî dikarin bigehêjin bal emelên xwe yên siyasî û nijadperestî. Hingê ala ol bi destê xwe girtin û bilind kirin, bi lêp û xapandin welatê musulmanên kurd dagir kirin. Ku ev lêp û xapandin ta îro jî, didome.

YEKÎTIYA ZIMAN

Ziman jî her wesan ji bo çêbûna netewe û gelan pêwistiyeke resen didêre. Loma gel bi navgîniya zimanê, hev û du nas dikin, ji hev fêhm dikin û hînî çand û dîrokê dibin.

YEKÎTIYA REGEZÊ

Yekîtiya regezê pêwendiyeke xwezahî ye di navbera takekesên mirovan de. Pêşîn biçûk bûne wek malbat. Paşê mezin bûne wek hoz, gel û netewe, mîna çexêzên Daireyên di nêv hev de.

YEKÎTIYA AX Û NÎŞTIMANÊ

Ew mercekî resen e ji bo damezrandina dugelê. Bi rastî yekîtiya ax û nîştimanê ku neteweyek li ser dijî unsureke herî girîng e. Li vir bila neçe dilê kesekî ku Kurdistan bûye pênc parçe û di navbera Tirkiye, Îran, Iraq, Sûrî û Sovyeta berê de hatiye dabeşkirin û gelê kurd ji vê unsura girîng bêpar maye. Bi pêçevane Kurdistana Mezin yek parçe ye. Di navbera parçeyên wê de hîç sînorên deryayî an bejî an mirovî nînin. Ji bilî kiryarên siyasî û nijadperestî ku ji alî van dugelên dagirkerên navborî yên ku li gor peymana "Sayx-pîko" sînorên dugelî danîne û Kurdistan parçe kirine Sal: 1916) ve, ku mebesta wan valakirina Kurdistanê ji gelê kurd bû, hatiye dezgahkirin. Lê digel ku tevahiya hêzên xwe bi kar anîn jî nekarîn ji sedê ./.10 ji erdnigariya Kurdistanê ji gelekî din re bikin war.

RAMANA HEVBEŞ

Ramana hevbeş jî unsureke girîng e ji bo sazkirina netewe û dugelê. Loma heta di nevbera takekesên neteweyê de ramana hevbeş çênebe, yekîtiya netewî çê nabe.

DÎROKA HEVBEŞ

Dîroka hevbeş hêz dide unsurên din û wan destek dike. Ew hêzeke derûnî û gelek xurt didêre. Divê ku hemû guzergahên dîrokiyên hevbeş yên ku netewe hemû rûdanên erênî û neyînî tê de jiyaye bine şopandin. Me di vê babetê de bi kurtî şirove kir loma ji mijara me re ev çend bes e.

Divê bê zanîn ku % 90 ji gelê kurd musulman in û ew di hemû unsur û mercên netewebûnê de hevbeş in. % 10 ji wan, peyrewên olên din in wek Êzîdî, Zerdûşî, Îsewî û cihûyan. Evên han jî digel kurdên musulman di yekîtiyên zimên, regez, ax û nîştiman, raman, aborî û dîrokê de hevbeş in.

Ev hemû yekîtiyên ku me gotî, li hember erdheja siyasî nemaze ya nijadperestî di xeterê de nin. Di bin siha vê nijadperestiyê de, dijminên vî gelî di tevahiya herêmên Kurdistanê de bi hemû fêl, fend û dezgahên xwe dixebitin ku takekes, malbat, hoz, komel û partiyên wan ji hev dûr bikin heta dijminî bêxin navbera wan. Ji bo ku yekîtî, bîrûbawerî, mafê wan ê siyasî, civakî, aborî û olî ji holê rabe. Eve xaza wan ya yekem e di hemû çerxên dîrokê de ta niha jî didome. Lê mixabin dirustiya vî gelî ji ola islamê re û dilzelaliya wî li hember zanyarên islamî bûne perde li ser van xazên dijminan û nabînin ne bi çavê zanistê ne bi çavê olê ka dijminan bi nihanî çi li berwan vedane û çawan xaz û dezgahan saz kirine. Xwezî min bizaniya ka ji niha paş zanist, ol û ev bûyerên

ku dibin, ewê bibin asteng di navera vî gelî û dubarebûna dîrokê. Gelo! We heye ku bibin kilîd ji bo vekirina çav û hişê wan ku paşê bibin kilîd ji bo vekirina deriyê bextê wan.

Paşê divê bê zanîn ku mirov her çi dibe bila bibe xwediyê hemû mafan e û berpirsyarê hemû pêwistiyan e. Hîç gelek ji gelekî din çêtir nîne û hîç ciyawazî di navbera takekesên gelekî de, ji hêla mafan û pêwistiyan ve nîne. Çi maf ji her kesî re hebe ji wî re jî heye û çi berpisyarî li ser wan hebe li ser wî jî heye. Ciyawazî di navbera sipiyên mirovan û reşên wan de nîne. Dewlemend û xîzan, samî û arî, sultan û geda hemû wek hev in.

Bi rastî pîvana xawêniyê di navbera takekes, peyrew û neteweyan de tenê parêzkarî û rajebexşî ji bo mirovan e. Xwedayê gewre gotiye: (Bi rastî qenctirînê we li bal Xwedê parêzkartirînê we ye.) sûreyê hucreyan (hucerat) 13. Ji ber hindê mezintirîn û girîngtirînên pêwirên pêxemberan, nemaze pêxemberê islamê (d.s.) bi cihkirina wekheviyê di hemû maf û pêwistiyan de her wesan, çandina reh û rîşên dadweriyê di kûrahiya giyanên mirovan de û parastina mirovan ji rezaletên xudbînî, ciyawaziyên hovaneyên çînan û rizgarkirina wan ji zincîrên siyasî û aborî, bû. Bi rastî ji rojgarê bastan ta îro, çend şer, doz û gengeşî rû dane hemû ji bo rastî û çewtiyê, tarîtî û ronahiyê, dadwerî û sitemkariyê, terxanî û wekheviyê, azadî û koledariyê û hinên din ji curên têkoşînê çêbûne.

Lê ez dibêjim, mixabin û ev gotina min rastiyek e ku tu carî û tu demê arîkariya "heq"ê nehatiye kirin û rojekê ji rojan ew nekeniye, rûyê wî di nav gelan de nebiriqiye, asumanê wî ji ewrên sitem û zordariyê sayî nebûye. Ji bilî çend rojên hindik di serdema Pêxemberê Mihriban (d.s.). Çawan ku şêx Tentawî gotiye: "Heq di riya Muhemed de ye. Lê tu kes di riya Muhemed de nîne." Ew neheqiya ku "Heq"ê li ser xwe pêwist kiriye ku pê re her tim şer bike, di her qalib û her rengê de li gor serdem û çerxên ku tê de dijî, di wêneyên curbecur de dixuyê û hin caran bi berevajiyê rasteqîniya xwe diyar dibe. Çawan ku helbesvanê gotiye:

"Gelek di rawestinê de bizav û di bizavê de rawestin heye

Gelek dîn di kufrê de û gelek kufur di dîn de heye"

Paşê ezê hin mafên ku Xwedayê Gewre di afirandina mirovan de tomar kiriye û olê bi zimanê pertûkên pîroz nemaze Qurana xweşxwan, daye derve û bûye sedem ji bo xwegorî kirinê, şirove bikim:

AZADIYA OL

Divê bê zanîn ku mirov di her hal û karê de çi musulman çi peyrewên olên din di baweriya xwe û di karên xwe yên olî û civakî de azane. Destê zordar û sitemkaran dirêjî wî nabe. Xwestina nezanan nikare baweriya wî pê bide terikandin an guhertin. Zextên dagirkeran wî bêgav nakin. Ew cihada ku ola islamê rewa dêraye, ne ji bo zordayina

olî ye. Belkê ji bo berevanî û parastina ol û oldaran e û ji bo rakirina sitemkarî û danîna dadwerî ye. Xwedayê Gewre gotiye: "Di ol de zorkirin nîne, heq û neheqî ji hev kifşe bûye." sûreyê Çêl. 258. Û dîsa gotiye: "Eger Xwedayê te hez bikira ewê hemû kesên di zemînê de bawerî (bi ola islamê) bianîna. Ew qey tu zor li mirovan dikî ji bo ku bawerî bînin." sureyê Yûnis 19. Dîsa gotiye: "Gelî bawermendan! Hûn li xwe binêrin gava hûn li ser riya rast bin, rê winda nikarin zerar bidin we" sûreyê Xwan (Maide). 105.

Ev azadî di ola islamê de gehiştiye radeyeke wesan ku hin tiştan ji kesên ne peyrewên xwe re rewa dêraye û ji peyrewên xwe re qedexe kiriye wek vexarina meyê ku ji bo nemusulmanên hevwelatî re rewa dêraye. Belê bi rastî, ji bo bawerî an perestişê "ling danîn ser" (ikrah) di mentiqa mirovan de cihê wê nîne û ji xwe, ji hiş û wicdanê re jî adapte nabe û ji berpirsyariya olî ya di cihanê de, ku azmûnhane ye, çewt dikeve. Hem jî pêxember û vexwendêrê ola islamê li hember Xwedayê xwe ji bilî girîngiya peyamê ku ragehandin e, berpirsiyar nîne. Çawan ku Xweday Gewre Gotiye: "Ji bilî ragehandinê tiştek li ser Pêxember pêwist nîne" Sureyê Xwan (Maide) 99. Baweriya mirovan jê nayê xwestin. Ta ku bê gotin Hz. Pêxember ji ber ku mihrîban û dilovan bû, ji kafirên bin destê xwe re musamehe kir û ji bo bawerkirina ola islamê ling danenî ser wan. Paşî yekê ji peyrewên wî jê re hebe ku bi darê zorê bi wan bide bawerkirin. Hem jî kitêba Xwedê baweriya bi darê zorê heram kiriye, çawan dê fermana zordayîna li ser baweriyê bike û rewa bidêre ku darê zorê bibe navgîn ji bo baweriyê. Her wesan, kerihîn û çewsandina kesên ku bawer nakin ji bo baweriya wan, jî wek ling danîn serê ye. Ji ber hindê Xwedayê Gewre gotiye: "Bi zanist û amûjgariyên rind vexwîne bal Xwedayê xwe. Û bi rindtirînê wêneyên têkoşînê bi wan re, tê bikoşe." sûreyê Heng (Nehl) 125.

Şêx Muhemed Ebdu gotiye: "Tiştên ku ji mirovên heqşinas tên xwestin ev in: divê ew kesên ku ji bîrkirine vebîr bike, nezanan fêr bike, li wanên ji rê derketî amojgarî bike, û rê nîşanî kesên rê winda bide." Wekî wesane ev xeyd, rehgirtin û çewsandinên mirovên îroyîn li hember kesên ku ne ji ol, terîqet, rêzik, perestiş û mezhebê wan in, rast bi rast ji nezanîna ol e. An ji bo berjewendiya kirêt e. An jî difinbilindiya li ser gelê cihanê û koledari ye. Ev hemû li ber çavên me di nav gelê kurd de diqewimin. Îmamê Xezalî di b. 2 ji pertûka "ihyailulûm" de weha nivîsandiye: "ya çaran ji mercên nehya munker (ji qedexeyên olî dûrkirin) ew e ku ew qedexe di bingeha ol de be, ne bi raya imaman. Wekî wesane ji yekî henefî re tune ku ji şafiiyekî re bibêje goştê sewalê ku bêbesmele hatiye serjêkirin mexwe. Û yekî şafiî nikare bibêje henefiyê meya nemestker venexwe."

Ev weha. Lê pêwistiya lê sorkirina li ser qenciyan û dûrkirina ji neqenciyan, di ola islamê de heye. Lê mijara wê ne li vir e.

AZADIYA RAMAN

Mirov ji bo karên her du cihanên xwe di raman û hiziînên xwe de azad in. Li ser ramanê, ji alî kesekî ve nayê pirsandin û tawanbarkirin. Hindê ku nede derve û ji ol û civakê re dijberî neke. Belê bi rastî tevahiya mirovan di cihanê de di raman û hizirînên xwe de azad in, li hember tu kesî ne ji hêla ol û ne ji hêla zagonê ve nayên pirsandin û tawanbarkirin. Ji bilî mirovên kurd. Loma raman û hizirîna mirovên kurd, di tevahiya karûbarên jiyanê de wek ola wan, di her pênc dugelên faşîstên dagirkerên Kurdistanê de, qedexe ye. Loma ew dizanin ku eger ew azadî ji wan re bê dayîn dê rêya zihna wan vebe û di encam de ewê bi hêjahiya xwe bihesin û bizanin ku mafên wan ên mirovahiyê hatiye talankirin, dûr an nêzik ewê hişyar bin û doza mafê xwe bikin. Ew sitemkar û nijadperest vê yekê ji xwe re xeter dibînin.

AZADIYA ZIMAN

Ziman ku ola islamê jî pejirandiye, ji girîngtirînên mafên mirovan e. Divê bê zanîn ku bi rastî mirov pêşîn di zimanê xwe yê resen de paşê di zimanên din de azad e. Dikare bi zimanê xwe bixwîne, têbigehe, fêr bibe, fêr bike û pertûk, namilke, kovar û rojnaneyan binivîse û biweşîne. Ji hêla ol ve hîç astengî nîne. Ji xwe vî mafî herî girîng ku tevî mirovan hatiye afirandin û ji girîngtirînên çalakên berdewamiya jiyanê ye, olê daye wan. Belkî ew nirx, giringî, radeya azadiyê û pêwistiya xwegorîkirinê çawan ji jiyanê re, her wesan ji zimanê re jî heye. Xwedayê gewre gotiye: "Afirandina asumanan û zemînê û ne ji hevbûna ziman û rengên we, ji nîşaneyên wî (Xwedê) ne." Sûreyê Rûm 22. Ango ziman nîşaneya Xwedê ye. Ew jî wek afirandina asumanan û zemînê, tuwanahî û meznahiya Xwedê dide diyar. Loma afirana wan, ne ji êkbûna reng û zimanên mirovan, karên mirovan nînin. Wekî wesane mirov li ser zimên deshilatdar nînin û nikarin destê xwe dirêjî zimanê kesên bin destê xwe bikin, ji holê rakin an biguherin. Belkî ziman aferîdeyê Xwedê ye û bi rêya wehyê ji Xwedê hatiye mêjiyê bendeyên wî.

Ev kiryarên ku dugelên sitemkarên nijadperest li zimanên gelên bindest dikin, ji bo pişaftin û helandina wan zext û zor dixebitînin, bi fermî zimanê wan qedexe dikin û rê li ber wan teng dikin, rast bi rast zulim û sitema serdema şaristanî û demokrasiyê û rabûna li hember suneta Xwedê ye. Çawan ku gotiye: "ji tu kesî re tune ku suneta (riya) min biguhere". Ev mînaka berçav ku li ber guh û çavên tevahiya gelên cihanê diqewime, ev zulm û zora ku li ser gelê kurd ji alî dugelên dagirkerên Kurdistanê ve tê meşandin di gel ku hemû gelên cihanê her tim dabaşa "mafê mirovan" dikin lê diyar e ku ew jî wek melê "Sîmurx" (Enqa) tenê navê wî heye. Kesek li hember van bûyeran dengê xwe nake. Wesan

dixwuyê ku li ser gelê kurd di her pênc dugelan de felsefeya Darwîn – ku mafê jiyanê tenê ji bo hêzdaran e – tê meşandin.

Pêwist e li ser hemû musulmanên ku bawerî bi Xwedê û şandiyên wî anîne ku bi hemû hêzên xwe li hember vê zulm û sitemê û yên wek wan jî, hewl bidin û têbikoşin, mirovan ji zulmê rizgar bikin. Loma pêwira ola islamê ew e ku zulmê li ser mirovan rake, heta ku dad û wekheviyê li ser tevahiya herêmên cihanê bi cih bike. Û newekheviya ol, reng û nijadan jî nede ber çav. Xwedayê Gewre gotiye: "Her wesan me hûn (musulmanan) gerandine umetek navîn, da ku hûn li ser mirovan bibin guwah (şahid) û Pêxember jî li ser we bibe guwah." Çêl 143. Ango me hûn bi hemû wateyên navîniyê, gerandiye navîn da ku hûn li ser wan bibin guwah di kêmasî û hîziyên wan de, wan islah û baş bikin, dadî û wekheviyê di navbera wan de bi cih bikin û wan ji sitemkarî û çewsandinan bidine paş.

AZADIYA HÎNKARÎ Û PERWERDEHIYÊ

Divê bê zanîn ku ji alî ola islamê ve mafê her kesî çi mêr çi jin, çi biçûk çi mezin, hatiya dayîn ku hemû zanistên ku ji bo wî an gelê wî hewce dike ji karûbarên ol an jiyana xwe fêr bibe û bi dersbêjî hinan perwerde û fêr bike. Ev hînkarî û perwerdehî bi kêjan zimanê û li kêj derê dibe bila bibe mafê her kesî ye. Xwedayê Gewre di destpêka wehya ku daşandiye ser Pêxemberê ku hatiye şandin bal tevahiya mirovan ve (d.s.) weha gotiye: "Bixwîn! Bi navê Xwedayê xwe ê ku te afirandiye, mirovan ji xwînpareyê afirandiye htd." Sûreyê Xwînpare (Eleq). Û ji bo handan û pesnê zanistê gotiye "Aya ewên dizanin û ewên nizanin wek hev in?" sureyê Civat (Zumer) 9. Û gotiye: "Xwedê ew kesên ku bawer kirine û ewên ku bûne xwedî zanist, bi (gelek) radeyan bilind kirine." sûryê Têkoşîn (Mucadele) 11. Sa di van ayetan de û di hin ayet û hedîsên din de, ji bo xwendin û zanistê û danzanîna behreyên zanistê û danzanîna ku zanist qiblenuma ya pêşîn e ji bo nasandina riya tevgera jiyanê , fermana Xwedê heye. Û Pêxember (d.s.) gotiye: "Zanyar wêrisên pêxemberan in." û hin ayet û hedîsên ku pesnê zanistê didin û ji bo xwendinê han didin.

Lê ew astengî û perdeyên olî an siyasî ku hin sitemkar û simsarên wan datînin navbera zanist û mirovan de, ew ji bo mirovan zulm û dijminî ye ku mirovan ji behreya gişti ya bi destxistî dûr dike. Di piştwan asteng û perdeyan de hin xerezên siyasî û desgahên pelîdî hene. Loma nezanin kelha wan Firewnên sitemkare ku girseya gel bi wê dimeşînin û tevgerên xwe yên hovane bi wê diparêzin û dîsa nezanin hin kapik in di destên hemû sitemkaran de û bi wan nêçîra berjewendiyên xwe dikin. Destên wan

bi destê heq, zanist û olê şil bin. Çawan ku her du destên Ebûleheb şil bûne.

Ev astengî û perde danîn di navbera zanist û mirovan de, di van serdemên dawî de di nav dugelên islamî nemaze di imparatoriya Osmanî û di herêmên Kurdistanê de bi destên deshilatdar, serok û şêxên kurd hat bi karanîn. Çawan ku li Ewrûpayê rojgarek dirêj ev yek ji alî dêrê ve, hat bi karanîn. Vî xewa han di despêka çerxa 10 (z.) de tevahiya dugelên islamê dagir kir. Ewrûpa jî hingê di xew de bû. Lê ew bi navgîniya zanistê, di çerxa 16 (z.) de ji xewa xwe ya dirêj, hişyar bû. Paşê Osmanî di çerxa 19 (z.) de hindik şiyar bû. Ango sê çerx piştî Ewrûpayê û bi wan re pêşbazî kir. Wek pêşbaziya kûsî yê ku di rê de xwe re diçe bi keroşkê tim hişyar û çalak re. Lê hînkariya bi zimanê mirov bi sûdtir û bi serkeftintir e. Loma gelê ku bi zimanê xwe perwerde be, ew zanistê digehîne hemû takekesên xwe. Lê ewê ku bi zimanekî din perwerde be, ew zanistê digehîne hindik takekesên xwe.

AZADIYA RÊZIK Û KEVNEŞOPIYAN

Divê bê zanîn ku ji her gelekî ji gelên cihanê re, hin çand, jêbermayî û rêzik hene. Ji kûrahiya jiyanê, ji çanda gelan û olan û ji tevgera pêşînan kelepîr mane. Di hêla ola islamê de mafê parastina wan heye. Wek mafê mirovan yên xwezayî, Lê, ku dijîtî bi ol an berjewendiyên gelemperî re nekin. Bi rastî ola islamê ew pejirandine û kirine mînak ji bo hin rewş û pêwistiyên olî. Ev ciyawaziya çand, kevneşopî û rêzikên gelan her wekî ciyawaziyên reng û zimanên wan ji kûrahiya dîrokê tê û ji sunetên (riyên) Xwedê ne, yên ku nayên guhertin. Xwedayê Gewre gotiye: "Eger Xwedayê te hez kiriba dê hemû mirovan kiriba yek gel. Lê vaye ji êk cihê ne." Hûd 118. Ango eger Xwedayê te hez kiriba dê hemû mirovan kiriba yek gel, rengê wan, zimanê wan û htd. yek bûya. Lê razên min xwest ku cihê bin. Min ew di ziman, reng, ol. rêzik û hin tiştên din de, ew ji êk cihê kirine. Vêcar evên han ku dixwazin bi hezkirina Xwedê re şer bikin û xwe li vir û li wir didin ku çand û zimanên gelên bindest ku ji ayetên Xwedê ne ji holê rakin, her wekî çand û zimanê gelê kurd di îro de, ew li kî derê ne?

ŞÊWIR AN HILBIJARTIN

Şêwir an hilbijartin, sazumanek olî û bingehî ye, ji bo avakirana dugel û deshilatdariyê. Xwedayê Gewre gotiye: "Û ewên ku fermana Xwedayê xwe pejirandine, nimêj dikin û karûbarê wan di navbera wan de bi şêwr e." sûreyê şêwr sûra 31. Pêkanîna şêwrê jî, li gor rêzik, kevneşopî û hezkirinên gelan diguherin

û ji hev cihê tên bikaranîn. Wekî we ye, deqa dadweriyê dixwaze ku deshilat (hukûmet) bi şêwir û biryara gel bê avakirin, Hem divê ku gelên cîhanê bihêlin ku her gel çarenûsa xwe bi xwe desnîşan bike û li gor çand, rêzik û kevneşopiyên xwe û bi şêwazekî guncan ji bo rewşa gel, dugela xwe saz bike. Ji bo hindê Hz. Pêxember riyekê vebir ji bo şêwrê desnîşan nekiriye. Lê ew ayeta ku dibêje: "Hûn hemû xwe li kapikê Xwedê bigirin û ji hev meqetin." sûreyê Malbata imran 103. Wateya wê ew nîne ku hûn hemû musulman bibin yek dewlet, yek ziman, yek çand û rêzik di bin alekê siyasî de. Û ne ku dibêje bila hemû gelên musulman di nav poteya gelekî de bihelin û bibin yek gel.

Belkî ew ferman ji musulmanên hingê ji ews, xezrec, Muhacir û yên din re ye ku hemû xwe li baweriyê bigirin û wê ji xwe re bikin deshilatdar di hemû karûbarên xwe de, dilên xwe bi hev ve girê bidin ji hev dûr mekevin, ji bo rik û heyfhildanên hozî û takekesî ji hev re mebin dijmin. Di perestişê de ber bayê nefsa xwe û serokên xirab mekevin û ji hev meqetin. Ev ayeta han jî vê wateyê xurt dike ku dibêje: "Û hûn mebin ji kafiran, ji wan ên ku ola xwe jêk veqetadin, bir bûn û her partiyek ji wan bi desxistiyên xwe şa dibin." Rûm 32. Çawan ku îro rewşa gelê me yê kurd û hêzên wan ên cihê û ji hev re dijmin bi hewayên hin serok û xerezkaran, li Behdînan û Soran ji herêmên Kurdistanê, wesan e. Her partiyek ji partiyên Kurdistanê bi destxistiyên xwe şa dibin. Divê ku ew partiyên me bên agahdarkirin ku di pişt wan perdeyan (kîn, iştiha hewa) de, hin girafîkên faşî û koledarî ne ku ji alî serok û hevkarên wan ên zanyarên olî ve, hatine dezgehkirin.

Lê belê, ciyawaziya gelan, di siyaset, rêzik û zimanên wan de, ji pêwistiyên xwezaya mirovahiyê, şerîeta dînê islamê û ji pêwistiyên mercên jiyanê ye.

MAFÊ JIYAN Û ABORIYÊ

Divê bê zanîn ku bi rastî mirov her kî dibe çi paşa çi geda, çi zanyar çi nezan Htd. jê re heye ku bi awakî baş bijî û ji hemû pêwistiyên jînê yên heyber û deronî sûd wergire. Hem jê re heye ku di rewşa jiyanê de, bi awakî rewa bigehêje sînorê herî bilind. Hîç asteng li ber wî nîne. Ji hêla ol ve tu asteng nîne, heta ku zerar negehîne meslehetên gel, wek xapandin, riba, israf, xirakirina bazarê, zerardana beden an hişên mirovan û berjewendiyên kesan. Xwedayê Gewre gotiye: "Ew (Xweday) e ku ji bo we hemû tiştên di zemînê de afirandiye." Çêl (Beqere) 39. Û gotiye: "Gelî bawermendan! Wan paqijên ku Xwedê ji we re helal kirî, Heram mekin û (ji tixûbên rewa) meborin." Xwan (Maide) 87. Û hin ayet û hedîsên din di vê babetê de...